# Muhleteke nû ji boyî daxwazkirina yekgirtina malbatê bi te re ku mafê penaberiyê li Norwêc standiye

Ji 1ê tebaxa 2017 an û pêve divê malbata te

- di **nava şeş mehan** de ji roja standina biryara te a mafê penaberiyê, daxwaza yekgirtina malbatê bi te re bike da ku tu ji mercê ku lazim e hatina te ya diravî têra xwedîkirina wan bike, werê istisnakirin.

UDI

Eger ew kesê ku dixwaze were Norwêc û bi te re bijî jin/mêr, hevjîn yan jî zoraka te be, hingî Birêveberiya karûbarên biyaniyan (UDI) dikare te ji mercê xwedîkirina wan istisna bike.

Îro divê malbata te dinava salekê de piştî standina te a mafê mayinê, daxwaznameya yekgirtina malbatê pêşkêş bike da ku ji mercê xwedîkirinê bê istisnakirin. Lê ji **1ê tebaxa 2017 an** û pêve wê hikûmeta norwêcî dest bi bikaranîna muhleteke nû ku şeş meh in, bike. Ev muhlet ji tarîxa derçûna biryara te ve tê hesabkirin. Ev tişt **tenê** li wan kesan tê meşandin ku mafê parastinê (penaberiyê) ji roja 1ê tebaxa 2017 an û pêve werdigrin.

## Gerek e tu agahdarê du muhletan bî

- **Di nava şeş mehan de ji tarîxa ku di biryarnameya wergirtina mafê penaberiyê a te de hatiye nivîsandin divê**
    - daxwaznameya yekgirtina malbatê bi şêweyekî elektronî di portala daxwaznameyan (Søknadsportalen) de liser malpera udi.no hatibe tomarkirin.
    - baca daxwaznameyê ku 8000 kron e hatibe dayin (ji zarokan re bê pere ye)

- **Di nava salekê de piştî ku te mafê mayinê li Norwêc wergirt divê**
    - ew kes/kesên ku daxwaza yekgirtina malbatê bi te re dikin li sefaret yan qunsulxaneya Norwêc amade bibin û belgeneameyên ku ji daxwaznameyê re pêwist in li wir radest bikin.

Eger malbata te daxwaznameya xwe di nava van her du muhletan de pêşkêş neke, divê ku tu mercê xwedîkirina malbatê bi cî bînî heta ku malbata te bikaribe mafê mayinê li Norwêc bistîne.